Ragehînên Te Ew Taybetîne

State Government Victoria Department of Human Services

Çi dê rû dit bo ragehînên liser te herçende tu berxorê (têberê) vê xizmetêyî?

Kîne Em?

Em êk ji hindek wan xizmetên çavdêrîya saxlemîyê û civakê ne yên li devera te, em hemî pêkve bi hevbeşî kardikin bo bicihanîna pêtivîyên we.

Çi Ragehînan Liser Te Em Kom Dikin?

Em navê te û dirêjîyên peywendîyê dihêlin li nav tomara berxora te. Dirêjîyên tir wekî pîlana te ya çavdêrîyê û ragehîn liser saxlemîya te dihêne tomarkirin her wextekî tu seredanekê bikî.

Bo Çî Em Ragehînên Te Kom Dikin?

Ew ragehînên em kom dikin harîkarî ya me dikin bo hêlana nûkirina dirêjîyan liser pêtivîyên te, ji ber hindê em dikarin çavdêrîya te bikin bi baştirîn rêk. Em dîsa van ragehînan bikardi înin baştir rêveberî û pîlan kirina vê xizmetê.

Çi kesên Dî Ragehînên Te Dibînin?

Ragehînên te dê êne dîtin ji layê wan pîşekarên mijûl dibin bi çavdêrîya te di vê xizmetê de. Bi awayekî din, em tenê ragehînan liser te belav dikin eger tu qayîl bikî yan eger bihête daxwazkirin ji layê yasayê ve, wekî di tengavîya bijîşkî de.

Çi Gotin Te Heye Derbarî Çi Dê Rû Dit Bo Ragehînên Te?

Te gotineka heyî derbarî çi dê rû dit bo ragehînên te. Em bawerî dikin liser wan ragehînên tu di dî me bo harîkarîya peydakirina çavdêrîya rasteqîne bo te. Eger te biryarda ku hindek van ragehînan dabê_ nekî yan radebikî bi asani wergirtina tomara berxorê ya te. eve mafê teye, belam çê dibit ew bandûrîyê li _îyaname bikit bo peydakirina ba_tirîn xizmetên çêbonbar bo we. Bêje me eger tu dixwazî biguhorî yan radikî qayîlbûna xwe.

Çawa Dê Ragehînên Te Êne Parastin?

Em derbest dikin bo parastina nihênîya tomara te. Taybetîya ragehînên te dîsa dihêne parastin ji layê yasayêve. Em dan standinê dikin ligel ragehînên te bi tekoztirîn (dijwartirîn) bawerî embarkirina wan bihêminî.

Ma Tu Dikarî Ragehînên Xwe Wergirî Bi Asanî?

Belê, te mafê heyî bo daxwazkirina wergirtina ragehînên xwe bi asanî û daxwazbikî ku bihête rastkirin eger pêtivî bit.

Çi Pirsiyarên Dî Te Hene?

Hîvîdarin ligel karmendên me bi axive eger te çi pirsiyarên dî yan gazinde hebin liser ku çi dê rûdit liser ragehînên te herçende tu berxorê meyî, yan eger tu hezdikî tu tomara xwe bibînî.